



# ROJA NU

ORGANA KOMELA KARKERÊN KURDISTAN LI SWÊD

HEJMAR 32-33
Ç.PAŞÎN-SİBAT 1982


# ÊRİŞÊ FAŞİSTAN LI MINTIQA ÇOLEMÊRGÊ BEYTUŞEBABÊ

Di despêka meha Tebaxê da komando û cendirmeyan, bona komkirina silahan li dora Zozana Mayinosê girtin. Dema sibê zû bû. Erişkeran bê sedem,li ser gund agir barandin û muxtarê gund kuştin. Keça Mixtêr xwe avête ser cendegê bavê xwe. Lê cendirmeyan dest avêtine keçikê, li ber çavê alemê ew tazî kirin. Edî sebra gundîyan nema û wan ji dest avêtine çekê xwe. Erişkeran ew tişt ji gundîyan bawer nedikirin. Xwe şaşkirin. Dawîyê da yuzbaşîyekî komando, tegmenek û nêzîkî 30 leşker hate kuştin. Helîqopterekî hate xistin. Zayîyata gundîyan ji muxtarê gund, zarokek û 5 çêlek bûn. Erişker revîyan û cardin ji ser gund da nehatin...

Cendirmeyên Çukurca û Uluderê, li mintiqa ku Xabûr derbazî Iraqê dibe, li wê, êrişî ser gundîyên xwedî pez kirin. Di nav van da şer çêbû. Dawîyê da başçavuşek, 2 leşker û yek jî ji gundîyan mir. Cendirme ew kire mane û dest da ser 4000 mîh û bizinên gundê Dêrahînê û bi zorê girt bir. Cendirme li gund jî 8 kes heya qefsîngê kir erdê û bi gulebaranê tirsand.Gundîyan ê dî ne karîn ku ji pezê xwe ra xwedî derkevin.

### NAHÊLIN GUNDI XARINÊ XWE JI DERVA BİNIN

Li mintiqa Uluderê, hukma leşkerî ya faşîst men kirîye ku gundên Hedrîş Yekmale, Mêrgeh, Bejik û gele gundên dinê ji derva xwarinê û cila ji xwe ra bînin. Cendirme her roj li ser gundan digrin, cilê mêran dişewitînin û bi zorê ji gundîyan pere komdikin.

### PİREKA 70 SALİ SER SERAN DALIQANDIN

Li mintiqa Uluderê gundê Bûlikê cendirmeyan ji gundîyan silah xwestin.Gundîyekî ji ber ku wan ra got "silahê min jî, perê min jî tune", cendirman li wî xistin û kirin ber mirinê. Dîya wî xwest ku kurê xwe ji lêdanê xilas bike, îcar cendirman girtin ew pîreka 70 salî bi lingê wê va, ser seran darê va daliqandin. Jinik ji sibê heya êvarê usa ma. Edî gundîyên bêçare zevîyên xwe, hiştirên xwe frotin, her yekî tifingek kirîn û dan leşker.

Li gundê Nîrehê Hecî Tank ra gotin, "tu pêşmergan ra xwarinê û cilan dibî", û agir berdan mala wî bi temamî şewitandin. Xwarina wî ya zifistanê,a lafê pez û dewarê wî jî hemû şewitî. Hiştirên wî û pez û dewarê wî jî bi temamî birin. Dîsa li vî gundî, mane kirin, gotin "hûn karê qaçaxî dikin" û dest dan ser 15 hiştirên(qatir) gundîyan. Ji ber Îsa Tank ne dîtin, jina wî Gula Şero anîn û 80 cop lê xistin.

Leşkeran li gundê Balîyê dest dane qasî 100 pezê gundîyan. Gotin we "beyannama" nedaye.. Ji yekî jî silah xwestin, got tune. Mala wî kevir li ser kevir nehiştin hilweşandin. Yekî feqîr bû, mal jî ya wî ne bû, ya yekî din bû. Di kirê da dima.

### GUNDÊN SİNORÊ RADIKIN

Gundên Aloş û Xodane ji ser sînor hatin rakirin. Gundî bêçare ji malên xwe derketin. Ew niha nêzikî qereqolê Bêjîhê di konan da dimînin. Serokê qereqol li wan teda dike û pêşkarî namûsa wan jî dibe.

Ji gundê Nêrwehê Husoyê Cano li hiştira xwe du tûr ard barkiri bû diçû gundekî din, Mêrga Mîran.Cendirme di daristanê da rastî wî hatin. Lê xistin û kirin ber mirinê. Bi bendê hiştirê darekî va girêdan. Şev gur hatin û ew û hiştira wî perçe perçe kirin.

Cendirmeyan ji gundîyên Kadunikê jî silah xwestin. Bona ku silahê wanî dayînê tune bû, hemû girtin û "bölükê" da avêtên hepsê. Her roj dor bi dor li wan didan. Yê ku bîrva diçû di kirin nav ava sar û davêtin girtîgehê. Ew di avakirina bînayên eskerî dan şuxulandin.

Meha çileyê pêşîn ji gundê Ziravikê ji mala Ozgun çend kes gazî Bölük'a Kadunikê kirin û jê şeşagir xwestin.Gotin, "heke hûn her yek, di nav 10 rojan da yekî neynin, emê we bikujin !" Di gund da muxbîrê hukma faşîst heye û silah jî difiroşe. Divê gundî biçin ji wî silah bikirin. Ji ber ku ew û zabitê tirk miştêrek in(pardan in).Lê gundîyan, çekê ku anîbûn, ji ber ku ji muxbir ne kirîbûn zabit ew qebûl nekir. Silahê dest mûxbir LAMA bû.Zabit ji gundî ra got, "Eger tu di heştikî da Lamayekî neynî, ezê jina te ji dest te bistinîm!" Gundî çû, 50 hezar da mûxtir û Lamayek anî...


Li vê mintiqê Îsa Başçavûş dibêjên yek heye ku mesûlê îdara leşkerî ye. Şev û roj li gundîyan teda dike, ji wan silah û pere kom dike. Her usa jî dest davêje namûsa xelkê. Li gundê Çeman namûsa keçikekê payîmal kir(navê keçikê li ba me heye, Roja Nu). Ji dîya keçikê jî xwest ku alîkarîya wan bike.

Evana, ji zordestîya leşker û îdare ya devleta Tirkîyê ya kolonîparêz û faşîst tenê çend mîsal in, û di van 2-3 mehên dawîn da bûne.

*Nivîskar û Serwerê Radyoya Erîwanê yê hêja Xelîlê Çaçan Muradov di 57 salîya xwe da çû heqîya xwe. Xebata wî ya mezin tucarî di nav gelê kurd da nayê ji bîrkirin. Ew di hemû jiyana xwe da bo azadîya gelê xwe û pêşdebirina Yekîtîya Sovyetistanê xebitî. Bila gor bihiştbe. Xebata wî ya giranbiha bibe ronahî ji me ra.*

## BONA BİRANİNA HOGIRÊ MEYİ ØELEMÊ

RİYA TEZE



57- salîya xweda wefat bû uzvê PKTS ji sala 1944-da qulixbirê serwerê para gazêta "Rya Teze", uzvê Tfaqa jurnalîstêd TRSS, suxulvanê kûltûra kurdaye sovêtîêyî berbiçev, jurnalîst û nvîskarê kurdî eyan Xelîlê Çaçan Mûradov. Îdî nava meda nîne ew komûnîstê helal û prîncîpîal, ew merivê maşoqê emr, hogirê meyî qelemêyî hizkirî.

Xelîl Mûradov mekteba partîaêye sêsaleye li rex Kommerkezîya PK Ermenistanê fakûltêda înstîtûta ermenîaye pedagogîêye Dûrekeye tarîqê kuta kiri - bûn.

Xelîl Mûradov gelekî zû dest bi şuxulvanîya xweye xebatê kiribû. Gundê xweda Emrê Tezeda (berê Kervansera,nehîya Aragasê) bûye sedrê kolxozê gele sala xebitîye çawa katibê komnehîya Elegezêye berêye komsomolayî pêşin, serwerê para komşuxulkira sovêta nehî

Dûmahik r.3

Hêzên pêşverû û welatparêz li Kurdistana Tirkîyeyê xebata xwe ya ji bona pekanîna hevkarîya hêzan gîhandin netîcekî. Ev xebat wek destpêka pêkanîna yekîtîya cepheyekî, gaveke dirokî û giringe. Belavokek di vê derheqê de hatiye belavkirin. Em bi kurdî û tirkî wê pêşkeşî xwendevanên xwe dikin.

# JI GELÊN TIRKİYÊ Û KURDISTANÊ JI HÊZÊN DEMOKRAT YÊN CİHANÊ RE

*Hêzên koledar, da ku li Tirkîyê û Kurdistanê nizamên xwe yên zordar û kedxwar biparêzin û bidomînin, herdem zor û teda li gelên me kirine û ew dane ber îşkencan. Heta di demên ku bi hindikahî demokrasiya bûrjûvazî jî hebû, hikûmetên karbidest, li hember tevgera sinifa karkerên Tirkiyê û têkoşîna netewî û demokratîk ya Kurdistanê, paşverû û zordest bûn. Nemaze ji pêşveçûna tevgera pêşverû û welatparêz ya Kurdistanê re qet tehamul nekirin. Bi çavsorî û hovî hewildan, da ku mixalefeta netewî û demokratîk ya ku li Kurdistanê pêşde de diçû, bipelixînin.*

*Di gel hinde zordariya hêzên koledar jî, têkoşîna sinifa karker û tebeqên kedkarên Tirkiyê û herweha têkoşîna netewî û demokratîk ya Kurdistanê, bi lez kemilîn û pêşve çûn. Heçî bûrjûvaziya monopolîst ya Tirkiyê bû, di bûhraneke mezin de bû. Têkoşîna gelên me ya ku xurt dibû, ev bûhrana ha mezintir û kûrtir kir. Li alîkî din jî, bûyer û guhartinên ku li herêmê qewimîn, menfaatên emperyalîzmê, nemaze yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), xistin tehlûkê. Ev jî bû sebeb, ku hem emperyalîst û hem jî bûrjûvaziya monopolîst ya Tirkiyê tedbîrên nû werbigirin. Berî her tiştî, bi destên hêzên faşîst yên resmî û sivîl êrîş birin ser gelên me. Di dawiya van êrîşan de, bi hezaran pêşverû û welatparêz hatin kuştin. Li gor planên pisporên CIA-yê (Tevgirêdana Navendî ya Îstîbarata Amerîkayê) bi xwe, terorîzm hate xurt kirin. Navtêdan û provakasyon hatin li dar xistin. Lê dîsan jî hêzên koledar bi van dek û dolaban ve negihîştin armancên xwe. Têkoşîna gelên me yên kedkar her ku çû bi hêztir bû. Di dawiyê de, roja 12-ê Îlona sala 1980-î, leşkeran li gor fêde û xwestekên emperyalîzmê û bûrjûvazîya monopolîst ya Tirkiyê, dest danîn ser hukim. Ji wê rojê bi vir de, cunta leşkerî ya faşîst, bi xwînxwarî û bêperwa êrîş dibe ser gelên me yên kedkar, hêzên sosyalîst û welatparêz yên Tirkiyê û Kurdistanê.*

*Cunta faşîst herçendî dibêje, ku:"Em ji bo pêşîgirtina terorîzmê û şerê biramujiyê, ji bo parastina mal û can û ji bo rizgarkirina demokrasiyê hatine ser hukim" jî, lê di rastiyê de derewan dike. Wê hîn bi karê xwe yê destpêkê ve da xuya kirin, ku ew ji bo pelixandina mixalefeta şoreşger û demokratîk û herweha ew, da ku "Gulistaneke bêî dirî û Tirkiyeke bêî pirs û pirsgirêk" bispêre emperyalîzmê û bûrjûvaziya monopolîst ya Tirkiyê, hatiye ser hukim.*

*Bi rêkûpêkî bikaranîna terora dewletê ve, welatên me seranser kirin gola xwînê, zîndan û îşkencexane. Bi sed hezaran pêşverû, welatparêz û sosyalîst avêtin zîndanan. Bi deh hezaran kes dan ber îşkencan û bi sedan kes di bin îşkencan de kuştin. Bi hezaran pêşverû bi daxwazên bidarvekirinê ve tên mehkeme kirin. Ji niha ve heşt welatparêz bi dar ve kirin jî. Maf û azadî yên demokratîk hemû bi tev de hilandin. Komele, sendîka û rêxistinên meslekî yên pêşverû hemû girtin. Destûra bingehîn, parlemento û hemû partiyên siyasî fesih kirin. Bi kurtî, bi zahîrî be jî, her çi tiştê ku li gor vîna gel pêk hatibe, hat belav kirin.*

*Bi qasî hindê jî, li hember êrîşên cunta faşîst mixalefeteke xurt nehat bi rêk xistin. Li alîkî din jî, hêzên welatparêz û sosyalîst ji êrîşên faşîzmê lêdanên giran xwarin. Vê yekê, jihevbelavbûna ku di nava hêzên demokratîk de hebû, zêdetir kir.*

*Da ku ev jihevbelavbûna ha dawî bêt û bawerî û îtîmata windabûyî ya gelên kedkar ji nû ve bête qezenc kirin, da ku tevgera şoreşger bêtir xurt bibe û dîktatorîya faşîst ya koledar bête hilweşandin, divê em gîro nebin û wext winda nekin. Ji bo bi rêk xistina têkoşîneke bi plan, program û paydar, divê em pirs û pirsgirêkên ku hene, hel bikin û hem li Kurdistanê û herweha hem jî li Tirkiyê bi giştî, hevkarîyên herî fireh, pişt re jî eniyan pêk bînin.*

*Di bin ala vê baweriyê de, em, ALA RİZGARÎ(AR), RİZGARÎXWAZÊN NETEWÎ YÊN KURDISTANÊ (KUK) û PARTÎYA SOSYALÎST YA KURDISTANA TIRKIYE (PSKT), me bi prensîpî biryar da, ku em li Kurdistana Tirkiyê hevalbendî û*

*Dûmahîk r.7*

Türkiye Kürdistanındaki ilerici yurtsever güçlerin aralarında bir güç ve eylem birliği ve giderekten bir cephe birliğinin oluşturulması konusunda bir süreden beri sürdürülen ön çalışmalar sonuçlanmıştır. Bu konuda yayınlanmış bulunan bildirinin türkçe ve kürtçe metnini okuyucularımıza sunmaktayız.

# TÜRKİYE VE KÜRDİSTAN HALKLARINA DÜNYA DEMOKRATİK KAMUOYUNA

*Türkiye ve Kürdistan'da sömürgeci güçler zulüm ve sömürü düzenlerini korumak ve sürdürebilmek için halklarımıza karşı sürekli işkence ve baskı aracını kullandılar. Kısmi burjuva demokratik dönemlerde bile iktidarlar Türkiye işçi sınıfı ve Kürdistan Ulusal Demokratik Mücadelesine karşı baskıcı ve gerici bir tutum içinde oldular. Özellikle Kürdistan'da ilerici yurtsever hareketin gelişmesine tahammül gösterilmedi. Kürdistan'da gelişen Ulusal Demokratik muhalefet en vahşi yöntemlerle bastırılmaya çalışıldı.*

*Sömürgeci güçlerin zorbalıklarına karşın Türkiye işçi sınıfı ve emekçi yığınların mücadelesi ile Kürdistan Ulusal Demokratik Mücadelesi hızla gelişti, boyutlandı. Türkiye tekelci burjuvazisi ise ağır bir bunalım içindeydi. Halklarımızın gelişen mücadelesi bunalımı daha da derinleştirdi. Öte yandan bölgedeki gelişmelerle emperyalizmin, özellikle ABD'nin çıkarları tehlikeye düştü. Bu durum gerek emperyalizmi, gerekse Türkiye tekelci burjuvazisini yeni tedbirler almaya zorladı. Özellikle sivil ve resmi faşist güçler eliyle halk güçlerine saldırıldı. Binlerce ilerici ve yurtsever bu saldırılarda canını yitirdi. Bizzat CİA uzmanlarının planlayıcılığında terör alabildiğine yoğunlaştırıldı. Provakasyonlar düzenlendi. Ancak bütün bu yollarla sömürgeciler amaçlarına ulaşamadılar. Emekçi halklarımızın mücadelesi her geçen gün daha da güçlendi. Sonunda 12 Eylül 1980 de emperyalizm ve Türkiye tekelci burjuvazisinin çıkarları ve talepleri doğrultusunda ordu eliyle iktidara el konuldu. Askeri faşist cunta o günden bu yana Türkiye ve Kürdistan yurtsever sosyalist güçlerine, emekçi halklarına en barbar yöntemlerle ve pervasızca saldırıyor.*

*Faşist cunta her ne kadar "terörizmi ve kardeş kavgasını önlemek, can ve mal güvenleğini sağlamak ve demokrasiyi kurmak için" iş başına geldiğini söylüyorsa da bütün bunlar yalandır. Onlar Türkiye ve Kürdistan devrimci-demokratik muhalefetini bastırarak, emperyalizm ve tekelci burjuvazi için "dikensiz bir gül bahçesi, sorunsuz bir Türkiye" yaratmayı amaçladıklarını daha ilk uygulamalarıyla gösterdiler.*

*Devlet terörü sistemleştirilerek ülkelerimiz baştan başa kan gölüne, zindan ve işkencehanelere çevrildi. Yüzbinlerce ilerici, yurtsever, sosyalist zindanlara tıkıldı. Onbinlerce insan işkencelerden geçirilerek, yüzlercesi katledildi. Binlerce ilerici idam talebiyle yargılanmakta, daha şimdiden sekiz yurtsever ise idam edildi. Demokratik hak ve özgürlüklerin en küçük kırıntıları bile yok edildi. İlerici dernek, sendika ve meslek örgütleri kapatıldı. Anayasa, parlamento ve siyasi partiler fesedildi. Kısacası, görünüşte de olsa, halkın iradesine dayanan tüm kurumlar dağıtıldı.*

*Bütün bunlara rağmen, faşist cuntanın saldırılarına karşı ciddi bir muhalefet örgütlendirilemedi. Öte yandan yurtsever, sosyalist güçler, faşizmin saldırılarından önemli darbeler aldılar. Bu durum demokratik güçler arasında önceden var olan dağınıklığı daha da arttırdı.*

*Dağınıklığın son bulması, emekçi halk kitlelerinin sarsılan güvenlerinin yeniden sağlanması, devrimci hareketin daha da güçlendirilerek, sömürgeci-faşist diktatörlüğün alaşağı edilebilmesi için, zaman yitirilmeksizin harekete geçilmelidir. Planlı-programlı ve kararlı bir mücadelenin örgütlendirilmesi için, var olan sorunların aşılarak, hem Kürdistan'da, hem de Türkiye genelinde en geniş güç birlikleri, giderek cephelerin oluşturulması zorunludur.*

*Bu inançla, bizler ALA RIZGARİ, KÜRDİSTAN ULUSAL KURTULUŞÇULARI (KUK) VE TÜRKİYE KÜRDİSTANI SOSYALİST PARTİSİ (TKSP), Türkiye Kürdistanı düzeyinde güç ve eylem birliğine prensip olarak karar vermiş bulunmaktayız.*

*Bizler, Türkiye Kürdistan'ında Ulusal Demokratik kurtuluşu hedefleyen en geniş bir güç birliğinden yanayız. Güç birliği platformunu, sadece kendimizle sınır*

*Dev.s.7*

# KONGRA PDK–ÎRAN

Kongra Partî Demokratî Kurdistan-Îran li Kurdistana Îran pêkhat. Kongreyê di 6.12.1981 destpê kir û di roja 10.12.1981 gîhişte dawîyê. Di Kongrê da ji 20 mintiqe 233 nûner (delege) civîyan. Gora destûra Partîyê ji her 250 endamî ra nûnerek tê bijartin.

Kongrê bi marşa "Ey Raqîb" destpê kir. Piştî komîta birêvabirina kongrê hat bijartin. Raportên komîta navbendî (merkezi) li ser xebat û hisêwê partîyê hatin xwendin, li ser axaftin çêbû û piştî hatin qebûlkirin.Rapora xebatê, behsa piştgirîya Komkar'ê kiribû û jê ra spas dikir.

Kongrê qebûl kir ku PDK-Îran tevli "Şuraya Millî a Muqavemet" be ku bo temamîya Îran sazbûye dijî rejîma kevneperest şer dike.

Kongrê slogana "Demoqrasî bo Îran, otonomî bo Kurdistan" cardin qebûl kir. Digel wê, slogana xwe yî dijî rejîma Xumeynî guhart: "Hilweşe dîktatorîya Xumeynî ya kevneperest, her bijî hukma demoqrat û azad ya gelên Îranê," danî pêş xwe.

Piştî Komîta Navbendî hat hilbijartin. Komîta navbendî ji 25 endamên eslî û 11 endamên berdest pêk tê. Komîteya nuh da endamên ciwan zêtir cîh girtin.

Kongrê bi axaftina serokê Partîyê Kasım Lo, gîhişte dawîyê.

Ji kongrê ra gelek mesaj hatibûn. Partîyên Iraqê (Partîya Komûnîst a Iraqê, Yekitî Niştimanî Kurdistan,Partîya Sosyalîsta Kurdistana Iraq) jî mesaj şandibûn û tê da êrişa Qiyade Miweqet protesto dikirin.

Wexta mesaja Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê hat xwendin bi alîyê Kongrê eleqeyek mezin dît. Xasima,kîngê behsa dosta nîya herdu partîyan (PSKT û KDP-Î) bû, Qiyade Miweqet hat protestokirin û pirsa Efganîstanê hat gotin, endaman rabûn ser pîyan û bi dilgermîyek mezin çapikên xwe lêxistin.

Di dema Kongrê da li ser rîya Bane û Serdeştê şerek mezin hebû, Leşkerê Îran û Barzanîyan bi hevra êriş dikirin ser hêzên watanî. Cîyê şer ji Kongrê 20 kîlomêtro wê da bû. Lê Kongrê bi serfirazî derbaz bû. Hukumeta Îranê ji Kongreyê bê hay bû. Piştî ku kongre hat îlankirin zêtir har bû û şer germ kir.

Piştî Kongrê komîta navbendî kombû, defterê sîyasî (politbüro) hilbijart û dîsa Abdurahman Kasimlo kir sekreterê giştî.

## BEYANA QAŞIMLO DI DERHEQA KONGRA 5,AN DA

Radyoya Dengê Kurdistan (Li Îran) di derheqa Kongra Partî Demoqratî Kurdistan ya 5'an da bi sekreterê Partîyê, Qasimlo'ra qisekir. Me ji vê beyanê çend bir guherande zarava yê kurmancî û pêşkêşî xwendevanan dikin.

Qasimlo, derheqa Kongrê da usa dibêje :

"Herwekî hûn dizanin, li gor destûra hûndurî, Partîya me gerek du sal da carê Kongra xwe çêbike. Me icar Kongra çend mehan pêş xist. Zarûreta pêkanîna kongrê ew bû ku, di şertên bi rastî usa girîng da, li Îran û li Kurdistanê, pêvist bû kongra Partîyê a 5'an sîyaseta borî ya Komîta Navbendî teswîp bike.Herçend me dizanî bû ku bi rastî pêkanîna kongreyeke usa karekî dijwar e, lê bawerîya me bi rêxistina xelkê Kurdistan û bi taybetî rêxistinên partîyê hebûn û her usa jî, ev kongre di bin topbaranê dujmin de çêbû û bi serfirazî karê xwe cî bi cî kir û ez usa difikirim ku vê kongrê jî xweş nîşan da ku partîya me bi alîyê karê teşkîlatîyê gelek pêşda çûye. Bi taybetî, ewê jî bêjim ku, ta xilasbûna kongrê dujmin qet agahdar nebû ku kongra Partîyê a 5'an pêk hatiye.

Helbet pêvîst bû ku kongre, sîyaseta me himber hukum (ya Îranê) teswîp bike. Herwekî hûn jî dizanin, wexta tu kongra 4'an pêk hat em di rewşa aşitî da bûn bi rejîma Xumeynî ra. Me wilo didît ku mimkûn e rêyek bê peydakirin ji bo mesela Kurd ku di rêyeke aşitî da jê ra çare bê dîtin. Lê pir mixabin, roj bi roj bêtir ji me ra xuya bû ku ew rejîma han amade nine ku hindiktirîn daxwazên gelê Kurd jî bi cî bîne û her usa jî, bi xuyayî derket ku heta amade nine hindiktirîn ji daxwazên gelên Îranê bi cî bîne. Lê dawîyê da sîyaseta me himberî rejîma Xumeynî hat guhartin û sîyaseta aşitixazî nema. Ji ber ku rejîma Xumeynî êrişek fireh anî ser Kurdistanê û em mecbûr man xwe biparêzin. Pêvîst bû kongrê vê guhartinê bide ber çav û sîyaseta me himber rejîma ser hukim tayîn bike. Kongreyê sîyaseta komîta merkezî teswîp kir û her usa, dîtina xwe nîşan da ku wext hatîye ku slogana hilweşandina rejîma Xumeynî bê bilindkirin û bi alîkarîya rêxistinên şoreşgerên seranserê Îran û bi taybetî, sazûmana Mucahîdînî Xelqê Îran,ew sloganan bi cîbê.

Helbet Kongre li ser "Şûra Millî a Muqawemet" jî peyîvî û teswîp kir ku Partîya me jî bikeve nav vê şûrayê.

Li alîyê din, yek ji wezîfeyên kongreyê ev bû ku, komîta merkezîya me, li dawîya îxaneta çend kesekî ku bi navê "Heft Neferî" nav û dengê wan bela bûye, kêm bibû, bê temamkirin. Kongrê, bi hilbijartina Komîta Merkezî ya nuh, komîta bi alîyê çendî û çonî jî bi hêz kir. Zarûreta pêkhatina kongrê ev bûn û bi rastî jî van zarûretan di hundur Partîya me da xwe nîşan didan. Û kongrê bi bexteyarî çêbû û bi awakî serfirazî karê xwe bir serî."

## KASIMLO LI SER BIRYARÊN KONGREYÊ USA DIBÊJE

"... Sîyaseta giştî ya partîya me nehatîye guhartin. Çar prensîbên partîya me, ku di kongra 4'an da jî hatibû teswîpkirin, di kongra 5'an da jî hate teswîpkirin. Ew prensîp ev in:

Xebat ji bo birîna nifûza împeryalîzm, bi taybetî împeryalîzma Amêrîkê di Îranê da.

Xebat ji bo demoqrasî damezrandina heqên demoqratîk ku niha ev prensîp dibe serkaranîna rejîmeke demoqratîk ku vê prensîbê bi cî bîne.

Xebat bo temînkirina daxwazên aborî û civakî yên zahmetkêşan seranserê Îran û her usa jî Kurdistan.

Dûre helbet xebat bo temînkirina otonomîya Kurdistan di çarçuva Îranek demoqratîk da.

Niha jî partîya me li ser van çar prensîban dimeşe.

... Hinek guhartin çêbûn di program û destûra partîyê ya hundur da. Ew guhartin ne zêde bûn, û bi alîyê kongrê hatin teswîpkirin.

Axir wezîfa kongreyê ya pir esasî hilbijartina komîta merkezî ya nu bû. Ew jî bi rastî bi awakî pir demoqratîk, herwekî ku usluba partîya me ye, çêbû û komîta merkezî ya nuh hat hilbijartin."

Derheqa cî girtina PDK-Îran di Şura Millî Muqawemet da jî Qasimlo usa got:

"Kongre li ser du prensîbên esasî sekinî. Yek ev e ku şertên niha li Îran, her usa jî li Kurdistan wê nîşan didin ku bi rastî, pranîya herî mezinê gelên Îran ji rejîma Xumeynî aciz in. Vê rejîmê rejîmek dij-gelî, kevneperest û xwînmij nasdikin. Ji ber vê, xuya bû ku di çarçuva vê rejîmê da qet ne mimkûn e ku daxwazên gelê Kurd û yê gelên dinî Îranê bi cî bê. Li alîyê din, Kongra gîhişt wê bawerîyê ku herçiqas alîkarîya partîya me bi organîzasyonên şoreşgerên Îranî ra bêtir bibe û herçiqas partî demoqratî Kurdistana Îran bi hevra bi van rêxistinan ra be, wê bikarin bi mîlyonan xelkê Îran bikişînin nav xebata dijî rejîma Xumeynî. Xuya ye wê çaxê îmkana serketinê jî bêtir dide.

Ev mesele ku hat behskirin, bê guman, mesela Şura Millî a Muqawemet jî hat meydanê. Programê ŞMM ji alîyê me da hatîye teswîpkirin.(...) Me program qebûl kir, ji ber ku slogana esasî ku wê daye ber xwe: Demoqrasî bo Îran, xumuxtarî bo Kurdistana Îran. Herwekî hûn dizanin, di programê da behsa "xumuxtarîya hundurî" tê kirin ku ev terîm ji alîyê partîya me hat redkirin. Ji ber vê ye ku, wexta em ketin nav Şura, me li Kek Mesûd Recewî, berpirsyarê Şurayê, xwest ku di nameyekê da vê meselê ronak bike.Lewra ew di nama xwe da dinivîse ku prensîba muqqedera xumuxtarî ya Kurdistan qebûl dike.

Em hêvî dikin ku di pêşîya me da ku programa Şura bi tevayî wê bê teswîpkirin, ev jî di programê da cîyê xwe bigre, ku bi rastî, xumuxtarî prensîbekî muqedes e û gotinê "hundurî" jî bê rakirin.

Herniha nûnerên me kar dikin ku bi nûnerên rêxistinên dinê ku di ŞMM da cî girtine, dipeyîvin ku kar û barên Şura baştir bikin û wezekî wilo hazir bikin ku, bi rastî, Şura ewqas zûtir bikare şertên hilweşandina rejîma kevneperestê Xumeynî pêkbîne û wezekî wilo hazir bike ku piştî hilweşandina vê rejîmê, rejîmek demoqratîk, ku di programa Şura da hatîye nivîsandin,bê ser kar."

Derheqa rewşa Kurdistanê (Îran) jî Qasimlo usa got:

"Hûn bi xwe jî dizanin ku, herçiqas quweta rejîma kevneperestê Xumeynî pir kêm maye, êrîşekî pir xurt anîye ser Kurdistanê. Her niha şerekî xurt ber dewam e. Di navbera du kongreyan da me bi sedan şehîd daye ku endamên partîyê bûn. Û mixabin, bi hezaran mirovên bê silah jî li dawîya bombebaran û topbaranên rejîmê hatin kuştin. Lê himber hemû xirabîyên vê rejîmê, îlan bikin ku, Kurdistana me û xelkê Kurdistan tu carî wekî îro yekgirtî û yek parçe nebûye. Ew jî di kongrê da bi xuyayî derket.

Lewra ez bawer dikim ku ev êrişana jî wê bê şikandin.

Kongra me, kongra PDK-Î biryar da ku kongra 5'an navê wê bibe Kongra Şehîdan. Ew rêzdanan (ihtiram) bû,ji bo hemû şehîdên ku di navbera du kongreyan da hatibûn şehîdkirin û canê xwe di rîya azadîya Kurdistana Îranê da

*Dûmahik r.7*

# AMERÎKA JI HEMÛ ÎNSANÎYETÊ RA MIRINÊ HAZIR DIKE

Emperyalîzma Amêrîkî, piştî ku Reagan hate ser hukim, zêtir zor dide çêkirina çekan, sexte li xebata aşitîyê dixe û di dinyê da xetera şer germ dike.

Ev cara pêşîne ku di dema aşitî da butça Amêrîkê ya leşkerî derdikeve ser 250 mîlyar dolarî. Hukma Reagan di butçê da beşa alîkarîya civakî 27 mîlyar dolar kêm kir û ew jî danî ser beşa leşkerî. Lê li Amêrîkê merivên betal, ku lê digerin û kar nabînin, ji 10 mîlyonî zêdetir in. Hukumeta Amêrîkaya Yekbûyî karxane venake ku betalxwe ra karekî bibînin û bixebitin. Alîkarîya civakî kêm dike û bi vî awayî merivên bêçare, kal, zarokên bêkes û xasima reşik û macîr zêtir perîşan dibin û destê hukumatê nagihe wan.

Reagan zor dide çêkirina çekan. Bombeyên notronê, bombeyên jehr (yên kîmyevî), yên mîkroban (ewên ku nexwaşî pêktînîn) dide ser hev. Reagan ji însanêyetê ra mirinê hazir dike.

Hatîye hisêwkirin ku kîloyek bombeya jehr dikare mîlyonek însan bikuje. Profesorên Amêrîkê vê yekê dibêjin. Lê Reagan dibêje, "ji me ra bombe lazim in!"

Bombeyek hîdrojenê dikare welatekî xerab bike û ji van bombeyan di dest Amêrîkaya Yekbûyî da bi sedan, bi hezaran hene. Lê dîsa jî ew yên nu çêdike...

Li dinyê her sal bi deh mîlyonan însan ji birçitîyê dimire. Tenê zarokên piçûk ku ji birçitîyê, bê dermanîyê dimirin salê da 17 mîlyon in. Lê Amêrîka alîkarîya miletên feqîr nake û mîlyaran dide çêkirina çekan.

Însanîyet şer naxwaze. Îsal li welatên Ewrûpê, her usa jî li Amêrîkaya Yekbûyî bi sedhezaran, bi mîlyonan însan meşîyan, dijî şer, dijî zêtirkirina çekan derketin û aşitî xwestin. Lê hukumeta Amêrîkê paç kirîye guhê xwe, guh nade daxwazên mîlyonan.

Welatên sosyalîst, xasima Yekitîya Sovyêt ceht dike ku zêtirkirina çekan bide seknandin. Ev çend carin ku serokê Yekitîya Sovyêt, Leonîd Brejnev gazî hukumetên welatên xerbî, û her usa jî gazî serokên Amêrîkayê dike, sekinandina çêkirina çekan û kêmkirina wan dixwaze. Lê Reagan û merivên dor wî guh nadine van pêşneyaran.

Hukumeta Amêrîkaya Yekbûyî, ne tenê îro, lê tim jî dijî sekinandina çêkirina çekan û kêmkirina, rakirina wan e. Amêrîka Yekbûyî tim jî dijî aşitîyê ye. Ji ber ku li Amêrîkê û li welatên împeryalîst yên din, hukum di dest sermîyana yektest e (sermîyana monopolîst). Ev şîrketên mezin bi çêkirina çekan hersal bi deh mîlyaran kar dikin. Çêkirina çekan bûye xwîna wan, hestîyê wan. Ew li ser hebûna şer dijîn. Ew dixwazin ku tim li dinyê şer hebe, dewlet bikeve hev û ji van çekan bikirin. Sermîyan şerxwaz e.

Serokcûmhûrê Amêrîkê, Reagan, berê di sînemê da lîstikvan bû û gavantî dilîst. Gavanên Amêrîkê ji bi nav û deng in.. Çekdar in û şerkar in, bo pênc quruşan û bo kêfê merivan dikujin. Xuya ye ku merivên herî dewlemend, sermîyandarên herî mezin, xudîyê karxaneyên çekan û xudîyê şîrketên niftê lê gerîyan û ji xwe ra yekî han dîtin, ew kirin serokcûmhûr...

Di cîyê Reagan da kî be jî, dive gora daxwazên van sermîyandaran kar bike. Lê Reagan vî karî zêtir bi dil dike, ev ji vî karî zêtir hez dike!

Çekên ku di dest wan da ye dikare dinyê çend caran hilweşîne û qulê xwe dê xweş nehêle. Dîsa jî çekan zêde dikin. Ji çek kêmkirinê ra razî nabin û aşitîyê naxwazin. Ber bi şer dibezin. Dewlemendîyên mezin, sed mîlyar dolaran di rîya kuştina însanan da xerc dikin. Meriv li wan dinêre, dibê evana dîn in?...

Lê dezgeya sermîyanê, împeryalîzm, dev bi xwîn e. Împeryalîzm har e. Ew tenê li kara xwe dinhêre û bona vê dikare dinyê ji binî hilweşîne, kevir li ser kevir nehêle.

Lê împeryalîst him usa dikin, him jî behsa azadîyê, demoqrasîyê dikin. Meriv şaşdibe. Evana tucar şerm nakin? Evana xelkê dikin cîyê boman? Dezgeyê împeryalîstan her usa jî li ser durûtîyê, li ser derewan çêbûye. Împeryalîzm wekî gurê ku postê berxan li xwe dike û diçe nêçîra berxan, usa ye.

Reagan, pirsa Polonîyê van rojana di devê xwe da kirîye benîşt. Ji xelkê Polonîyê ra azadî dixwaze! Perê mi lêkeyan li xwe kirîye! Reagan bo Polonîyê çi dixwaze? Daxwaza wî eşkere ye: Sazûmana sosyalîstî hilweşe, sermîyandar şunda bên. Li cîyê sazûmana sosyalîst sazûmanêk kevneperest û zor dest çêbe. Xebatkar cardin bikevin bin nîrê sermîyandaran. Lê ev tişt ca ran dibe? Tekerê dîrokê cardin di şun da vedigere? Çem ber bi serê çîyan dîherikin?.

Bi rastî, Reagan bi xwe jî zane ku usa nabe. Lê ew bi vê şematê dixwaze serê xebatkaran gêjo bike, derheqa sosyalîzmê da wan bêxe nav şikê. Zirarê bide welatên sosyalîst. Pêşî li tevgera aşitîyê bigre. Çêkirina çekan wek tiştekî heq nîşan bide.

Pirsa Polonîyê di demeke usa da geş bû ku tevgera aşitîyê di welatên roja va da bilind dibû. Her roj di bajarekî da sedhezaran însan, çêkirina çekên nuh, û bi cî kirina wan li Ewrûpa Xerbî protesto dikir. Xelkên dinyayê bi qirika împeryalîstan girtibûn. Di demeke usa da bûyerên Polonîyê geş bûn. Bi rastî, ajanên împeryalîstan, peya û xulamên wan ên hundur Polonîyê karekî baş pêkanîn. Împeryalîstan şematekî usa derxistin ku toz û dûman tevli hev bû. Gele merivên bê hay û bodele bo Polonîyê gîrîyan.. Împeryalîstan pirsa Polonîyê danîn ber her tiştî. Pirsa Polonîyê bo hemû zordestî û pîsîyê împeryalîstan, bo hemû diz û keleşan bû perdeyek.

Niha Yekitîya Sovyêt gazî Amêrîkaya Yekbûyî dike, dibê "werin em rûnin, pirsa sekinandina zêtirkirina çekan û kêmkirina wan qisebikin", Amêrîka dibê, "Na, berê em pirsa Polonîyê qisebikin.." Li Madrîtê da Civîna Hevkarî û Parastinîya Ewrûpê pêktê, Amêrîka, hemû zordestî û xirabîyên xwe û hevalên xwe dide alîyekê, dibê "berê em pirsa Polonîyê qisebikin!"

Li Polonîyê çi bûye? Meriv ji birçitîyê dimirin? Di zîndanan da bi teda û lêdan merivan dukujin? Bajar û gundan bombe dikin? Polonîyê dest daye ser axa miletekî din? Çi bûye li wê?.

Lê xelk baş pê dizane ku sedemê ewqas şemate û zirte-zirta împeryalîstan çiye û ew û hevalbendên xwe li çaralî dinyê çi pîsî, qirêjî û zordestîyan pêk tînin.

Em li pirsa El Salvadorê binhêrin. Li wê dîktatorîya zordest û xwînrêj ku pişta xwe daye Amêrîkaya Yekbûyî, ji par vir da ji 40 hezarî zêtir însan kuşt. Amêrîkê di van rojan da 1,3 mîlyar dolarê din dixwaze bide vê rejîma zordest. Aqilmendên û generalên Amêrîkaya Yekbûyî bi hezaran li wir in û tevî hêzên dîktatorîyê bo şikandina tevgera gelê El Salvadorê şer dikin. Amêrîka çima vê pirsê qisenake?.

Li Afrîqa Cenûbî hukumeta nijadparêz bi navê mîlyonek merivên sîsik, 10 mîlyon reşik-ku xudîyê wî welatî ew in- kirîye nav rewşeke xirab, li wan zulmeke ne dîtî dike, dixwaze wan bi temamî ji welatê wan bajo der. Amêrîkaya yekbûyî bi xurtî piştgirîya vê rejîma xwînrêj dike.

Rejîma faşîst li Şîlî bi destê Amêrîkê hat ser hukum, bi deh hezaran însan kuşt û Şîlî ji wî miletî ra kir zîndan. Îro jî ew tişt, bi alîkarîya Amêrîkê li Tirkîyê çêbûye û dimeşe. Li Tirkîyê da 100 hezar însan di zîndanê da ye. Hukma faşîst bi sedan însan kuşt, zîndan bi xwîna însanan sor bûn. Hukma faşîst li Kurdistanê zulmeke ne dîtî dîke. Û Amêrîka ji vê rejîmê ra çepikan lêdixe, Piştgirîya wê dike.

Îsrayîlê dest daye ser axa Filistînê, Filistînî bi mîlyonan ji welatê wan ajotîye der, zulmê li wan dike, erdê dewletên Ereb zeftkirîye û jê ra xudî derdikeve. Hîn nuh dest da ser axa Sûrîyê û dixwaze bike nav sînorê xwe. Amêrîkaya yekbûyî çima pirsa Îsrayîlê qise nake û nahêle bê qisekirin. Amêrîka bi hemû hêza xwe piştgirîya Îsrayîl dike, çek û pere dide û wê diparêze. Çend roj berê, Amêrîkê ne hişt ku Konseya Parastinê ya Miletên yekbûyî biryar bigre dijî Îsrayîl û biryara wê vêto kir. Piştî wê Civîna tevayî kombû û dijî Îsrayîl, bi piranîyek xurt (bi 86 rayan) biryar girt. Amêrîka bona vê yekê gelek qehirî, li yekitîya Miletan laf û qef xwarin. Nû nerê Îsrayîlê êrişker û yê Amêrîkaya Yekbûyî bi yek devî qisekirin.

Lê evana hemû durûtîya Amêrîkaya Yekbûyî xweş dide ber çavan. Ew nikare xelkê dinyê bixapîne.


Amêrîkaya Yekbûyî sîyaseta zordestîyê, ya şer û kevneperestîyê dajo. Ew dijminê aşitîyê ye.

Lê Amêrîkaya Yekbûyî û hevalbendên wê- wekî Taçera dêlegur û yên din û xulamên wan ên li çaralî dinyê dikarin rê li ber pêşveçûna însanîyetê bigrin? Tucar nikarin. Perê wan û çekê wan çiqas pir be jî, ew nikarin Dinyaya xweşik û ronak bikin tarî û bişewitînin. Xebata aşitîyê dajo û roj bi roj wê mezin bibe. Roj bi roj li welatekî nu hêzên pêşverû, hêzên şoreşê, hêzên ronahîyê bi ser dikevin. Cîyê Împeryalîstan roj bi roj teng dibe. Derewê wan di welatê wan da jî eşkere dibe.

Dawîya împeryalîzmê, zû an dereng, wê bê.

Rojên pêşîyê ya însanîyeta pêşverû ye.

# SIN'ET Û ÇAND



CIGERXWÎN

## Jı Tora Bılind

Ebû Neîm Hafiz Ehmed kurê Ebdulah kurê Ehmed kurê Îshaq kurê Hiwês kurê Mehranî Esfehanî.

Nivîşteke wî bi navê Huliyet El Ewliya heye. Bi xwe mezinên pêzanê(hedîsî) ye. Her wekû ji rastbêjên guhêzkaraye. Li nik mirovên mezin xwendiye , ji mirovên mezin hedîs bihîstiye, gelek mirovên mezin li nik xwendine û hedîs jê bihîstine. Nivîşta wî jî di vî warî de ji başê nivîştaye.

Her wekû tarîxa Esfehan jî wî çekiriye. Kurê Xulikan di tarîxa xwede dibêjî: Min ji tarîxa wî ev tiştên ha guhaztine ko dibêjî:

Kalikê min -Mehran misilman bûye û li nik. Ebdulah kurê- Muawiye mezin bûye û hatiye xwedîkirin. Bavê min di sala 365 koçî de serê xwe daniye. Ev Ebû Neîm bi xwe di sala 336 de çêbûye di sala 435 koçî de serê xwe daniye û li Esfehan hatiye veşartin. Kurê Xulekan pêde diçî û dibêjî: Esfehan yek ji mezintirînê bajarên çiyêye û çiya perçak ji Kurdistanê tê jimartin.

Tarîxzan dibêjin: gelek ji eşîrên kurd ketine nava bajarê Esfehan û gelek jî li hawîr wê cî girtine.

Ji lewra em pêzan û hozanên Esfehan di nav pêzan û hozanên Kurdistan de didin xuyakirin. Ji vî bajarî gelek mirovên mezin-navdar rabûne, ko winê di peşde navên wan bibênin.

Ebû Hesen Ehmed kurê Yihya kurê Îshaqê Rewadî:


Ev pêzanê mezin di zanîna kelam û nehwêde navdare û pêzanekî mezin û hozanekî bi denge. Yek ji payebilindê çaxê xwe ye. Her wekû gelek nivîştên hêja çêkirine û sed û çarde nivîşt nivîsîne ko serê mirov naçare li ber meznahiya wî dikevî ber mirov.

Min bi xwe (53) pêncî û sê nivîşt çêkirine û li hember vî mirovê mezin serê xwe xwar dikim. Ji xwe şerm dikim ko çima ez nikarim bighême rêza wî.Çawa ko di "kelam" de gelek devjenî bi mezinên pêzanên çaxê xwe de kiriye û rêçeke ser bi xwe di kelam de girtiye. Pêzanên kelamê rêçika wî guhaztine nivîştên xwe. Di sala 245 de li Rehba kurê Toq serê xwe daniye. Li hin dibêjin: Li Bexdad serê xwe daniye. Rawend gundeke li hindama Esfehane û Rawendî eşîreke kurde her wekû bajareke, ko dikevî rajorê Hewlêr (Erbîl) û perçak ji leşkerê Ebî Mislimê Kurê Xerasanî ye.

25.12.1981 / Stockholm

## STRANÊN ME SERBILINDİYA MENE

TEMÛRÊ XELÎL



"Eger ji folklora (zargotina) me tenê stiranên me bimana, dîsa ji cihanwê bigota, ku gelê Kurd gelekî aqilbende" Nava van xeberêd hîmdar, serok û berpirsiyarê radioa Rewanêye kurdî Xelîlê Çeçan rastiya her heye. Û gelê kurd çawa ku dengbejêd usaye bi nav û deng dane, usa jî pêşewitîkî sazbendîya meye wî awakî daye, çawa ku Xelîlê Çaçanê remetiyê. Ewî 24 salanda 1500 stiran ji dengbêjên kurdên cîhanê nvîsîn û dîyarî kir bo gelê xwe û ji wan stirana her yek bûye heykelek bona bîranîna wî. Ew stiran wê hetahetayê bi Radioa Rewanê bêne dayinê; pirên wana jî bi destê wî ketîyê destê komelên kurdaye li Awropaê, kîjan bi saya sêlika û kasita li cîhanê belavkirine, dengê dengbêjên kurd gîhandine her miletekî cîhanê.

Têorîya Marksîzm-Lênînîzmê dide kivşê, ku hemû gel, hela wî çaxî jî,gava ewana alîê sîyasetîê û aborîêda têne zêrandinê, dikarin emekê xweyî giranbiha bixine nava xezna çanda hemcîhanê. Şedetîya vê yekê dide dîroka pêştaçûyina çanda gelê kurd. Hunermendê gelê ermeniayê pir mezin di dereca stiranada-Komîtas xebateke hêle kirye na va pêşketina çanda kurdaye sazbendîêda. Ew bajarê Berlînêda pir salan saz bendîya kurdava mijûl bûye. Ewî sazbendîya kurda kire têma dîplomîê ya temamkirina konsêrvatorîaê û bi wê ye kêva nasîya avropîya da nimûnêd sazbendîya gelê kurdaye bi sedsalaye here baş.

Berî dîwana Sovîêtî pêxemberê sazbendîya ermenîayê miletîê Komîtas bi xemxurîke mezinva, bi dilovanî û bi biratî dengnivîsar û helkirina sazbendîya (mûzîk) kurdava mijûl bûye, lî ser wê xebitîye û gelek fikrêd têorêtîk û praktîk pêşda kişandine.Ev yeka dide kivşê îtêrnasîonalizma hunermendê hêja. Komîtas bilî wê yekê, ku bi deha stiranên gelê kurda nvîsîne, usa jî bona koma dengbêjîê "lûr de lûr" , "herê wayê" û stiranên mayîn hazir kir. Usa jî çend aşiqêd ermenîayî eyan sazbendîya kurdava mijûl bûne, ji ber ku nava wêda gelek awazêd bedewetîêye granbaha dîtine, êd ku hesab di bin berê (emegê) fikra gelê kurdaye efrandarîê.

Nava çanda gelê kurdda cîkî pirqîmet digre cewahîrêd (lal û dûr) sazbendîê hema ev bû menî, ku pir sazbendên ermenîayê bi nav û deng bi hewaskarîke mezinva berbirî sazbendîya gelê kurda bûne, alî pêşketin û gulvedana wî karê sîanetî kirine.

Sazbendîya kurdaye folklorê pir qedimîye, ew bi zar jî nisleteke derbarî nisleteke mayîn bûye, lê hilbet, gelek cewahirêd folklorê unda bûne, pûç bûne, ji ber ku ew wextêda ne hatine nvîsarê. Her tenê pey serketina Oktobra mezin mecal hatine sazkirinê bona berevkirin û helkirina sazbendîya kurdaye folklorê. Saya vê yekê pir efrandinêd gele hêja ji undabûnê hatine xilazkirinê. Û çimkî sazbendzanê kurdaye pêşekzan tunebûn, ew hîmlî ji alîê sazbendzanêd ermenîyada hatine nvîsarê.

Folklora kurda hesab dibe ênsîklopêdîa jîyan û dîroka gelê bi zar,ji kîjanê her yek hîn dibin, karê lê distînin. Ji folklorê em dikarin dîroka gelê kurdaye derbazbûyî, hal û wextê wêyî aborîê, berbirîbûna gel ber bi çande pê bihisin.

Bir û bawerîêd Oktobira mezine azadar ketine nava lîteratûra gelê kurda ye bedewetîê û nava hunermendîya wêye aşiqîê. Salêd dîwana Sovêtîê dengbêjên kurd qam-qanatê nuh stendin. Wana derheqa jîyana nuhe bextewar, Lenînê mezin, keda helal, pêşketin û zoraya wetenê meyî sosyalîstîê stiran. Tevî helbestvan û nvîskarêd kurda salêd 30-î usa jî gelek aşiq-dengbêjên kurda pêşda hatin, çawa mesele Etemê Silto, Ahmê Çolo, Nazûk, Celîlê Eco êd mayîn. Bilî wan, dempaşê gelek aşiqdengbêjên cahil pêşta hatin, stranêd kêjana nava gelda belabûn û radioêda hatine nvîsarê.

Komera meda çiqas olîmpîada (hemcivînêd sazbendîê) derbaz bûne, komêd kurdaye stiran û reqasê û dengbêj pêşda hatine û gelek jî wana hêjayî pêşkêşa bûne, alîê temaşevanada rind hatine qebûlkirinê.

Sala 1932-a Rewanêda cara pêşîn bi zimanê kurdî berevoka sazbendîê ronahî dît, xudanê kîjanê Samson Gasparyane ermenî bû, ku rind kurdî zanibû û haj kurda hebû. Nava wê berevokêda 12 stiran cîwar bûn, çawa bo nîmûn: stiranêd "Întêrnasîonal", "hevalno mêrxasî" û çend stiranêd şorişgerîêye mayîn.

Salêd 30-i zanîngeha Rewanêye Pêşkarxazîye (mamosteamadekirinê, pedagogîê) kurdîda nava 7 salada xebateke mezin hate kirinê bona pêşdaçûyîna sazbendîya gelê kurdada. Li vir koma dengbêjîê hebû, bi zmanê dê(zikmakîê) sazbendîê derbaz dibûn.

Ermenîstana Sovîêtda demên cihê-cihê êkspêdîsîa hatine teşkîlkirinê bona ji gunded kurda stranêd kurdî binvîsin, êd ka paşê bi berevokêd cihêva ronahî dîtin. Ew hevala (Pîrêd wan ermenî bûn) weke 400-500 nimûnêd stiranêd kurdaye here rind berev kirin,pirê kîjana hatine çapkirinê.

Kompozîtorê cîhanêyê nav û deng Aram Xaçatoryan balêta xweye "Gayanê" da çend perçêd sazbendî ya gelê kurdaye xebatê, çawa mesele "reqasa Eyşê" . Lê efrandina wîye "Reqasa bi Şûra" berê dihate navkirinê çawa "Reqasa kurdêd Cahil".

Pirtûka pêşîn ya ku xudanê wê bi xwe kurd bû ya derheqa sazberdîya kurdada (bi zimanê kurdî) sala 1963-a alîê nvîskarê mezin Xelîlê Çaçan Muradovda ronahî dîtîye. Wêda pir stiranên heja hatine cîwarkirinê. Ev stiranêd nuh, ên mêranîê (mêrxasîê) bengîtîê û govenddêne.

*Dûmahik r.7*

## JI GELÊN TIRKİYÊ Û KURDİSTANÊ RE

Dûmahîka r.2

hevkariyekê pêk bînin.

Em, li Kurdistana Tirkiyê, hevkariyeke fireh ku rizgariya netewî û demokratîk ji xwe re bike armanc, dixwazin. Em platforma hevkariyê bi xwe tenê de nabînin, lê belê em hevkariya herî fireh ya ku ji hêzên pêşverû û welatparêz pêk bêt, hewce û zerûrî dibînin. Ji lew re, hewce ye, ku em hemû bi hev re hewil bidin, da ku astengên ku li Kurdistanê û Tirkiyê li pêşiya hevkariyê hene, yan jî yên ku derkevin pêşiya riya hevkariyê, ji holê rabikin. Ji bo vê armancê, wek me heta îro kir, em ê ji vir û bi ha de jî, xebata xwe ya ji bo pêkanîna hevkariyeke herî fireh, bi awakî misoger bidin domandin.

Gelî Pêşverû û Welatparêzên Kurdistanê !

Ji bo ku em berpirsiyariyên xwe li hember gel bînin cîh, merceke bingehîn e, ku divê em hevalbendiyekê pêk bînin. Hevalbendiyeke wisan, ku hêzên welatparêz tê de gihabin hev, da ku gelê me yê kedkar pê bawer bibe. Herweha, da ku jê eniyeke netewî û demokratîk biafire. Divê em di vî warî de pêrabûnên xwe yên ku dikevin ser milên me, bînin cîh û behra xwe têxin nav kefteleftên bi vî celebî.

Herweha em, KUK, AR, PSKT, li Tirkiyê bi giştî, têkoşîneke ku li ser hîmên biratî û yekîtiya têkoşînê pêkhatibe, ku hilweşandina cunta leşkerî ya faşîst û koledar û avakirina îqtîdara demokratîk ya gel ji xwe re kiribe armanc, hewce dibînin. Ji vî aliyî de, em di navbera hêzên şoreşger û demokratên Tirkiyê de hebûna hevalbendî û hevkariyeke herî fireh, ku hêzên welatparêz û sosyalîstên Kurdistanê jî wek hêzeke yekbûyî tê de bin, rastir dibînin. Piştî pêkhatina vê hevalbendî û hevkariyê, em pişta çêkirina eniyeke demokratîk û şoreşger, ku li dijî emperyalîzmê û faşîzmê be û mafê çarenûsî yê gelê Kurd binase û wî têke programa xwe, digirin. Li gor mercên objektîv yên îroyîn ku li Tirkiyê û Kurdistanê hene, hevalbendiya bi tenê di havbera hêzên ku ji aliyê îdeolojîk û siyasî de nêzîkî hev in, şaş e. Ev celeb siyaset rêzên hevalbendiyê teng dikin. Ji ber vê yekê, em ê hewil bidin da ku hevkariyên herî fireh pêk bînin û alîkariya hevkariyên ku hene jî bikin.

Gelî Welatparêz, Pêşverû û Sosyalîstan !

Divê em hevalbendî û hevkariyên herî fireh yên ku hemû hêz bikaribin tê de cîhên xwe werbigirin, pêk bînin. Divê em li hember bela faşîzma ku di ser gelên me de girtiye û herweha li hember zordestiyên koledaran têkoşîna xwe xurtir bikin. Ji lew re jî, divê em astengên ku hene, ji holê rabikin. Piştgirtin û dostaniya di navbera hêzên pêşverû û welatparêz de têkûztir bikin. Pêkanîna vê yekê û herweha afirandina hevkariyên herî fireh, pêrabûna me hemûyan e, acîl û zerûrî ye.

- BIJÎ HEVALBENDÎ Û HEVKARÎYA HEMÛ PÊŞVERÛ Û SOSYALÎSTAN !
- BIJÎ TÊKOŞÎNA NETEWÎ Û DEMOKRATÎK YA KURDISTANÊ !
- BIMRE CUNTA LEŞKERÎ YA FAŞÎST Û KOLEDAR !
- BIJÎ YEKÎTIYA TEKOŞÎNA GELÊN TIRKIYE Û KURDISTANÊ!

ALA RIZGARÎ KÜRDİSTAN ULUSAL KURTULUŞÇULARI (K U K)

TÜRKİYE KÜRDİSTANI SOSYALİST PARTİSİ (T K S P)

## TÜRKİYE VE KÜRDİSTAN HALKLARINA

Baş.s.2

lı görmeyip, ilerici-yurtsever güçlerin en geniş birliğini gerekli ve zorunlu görüyoruz. Bu nedenle, Türkiye'de ve Kürdistan'da güç ve eylem birliklerinin oluşması önünde var olan ve çıkabilecek engellerin çözümü için birlikte çaba göstermeliyiz. Bu amaçla, en geniş güç birliğini sağlamak için şimdiye kadar olduğu gibi bundan böyle de çabalarımızı kararlıca sürdüreceğiz.

Kürdistan'lı İlericiler, Yurtseverler !

Halkımıza karşı sorumluluklarımızı yerine getirmenin ilk koşulu Ulusal Kurtuluş yolunda yurtsever güçlerin birliğinin sağlandığı, emekçi halkımızın güven duyduğu bir güç birliğini, giderek Ulusal Demokratik bir cepheyi oluşturmaktır. Bu uğurda üzerimize düşen görevleri yerine getirmeli bu tür çabalara güç katmalıyız.

Yine bizler KUK, A.R ve TKSP Türkiye genelinde halklarımızın kardeşliği ve mücadele birliği temelinde sömürgeci, askeri-faşist cuntayı alt ederek, DEMOKRATİK HALK İKTİDARINI hedefleyen bir mücadeleyi zorunlu görüyoruz. Bu doğrultuda, Kürdistan yurtsever-sosyalist güçlerinin de bir birlik halinde içinde yer alacağı, Türkiye devrimci-demokratik güçlerinin en geniş güç ve eylem birliğinden, giderek anti-emperyalist, anti-faşist ve Kürt halkının kendi kaderini tayin hakkını da programlayan, bir devrimci demokratik cepheden yanayız. Türkiye ve Kürdistan'da yaşanan bugünkü nesnel koşullara göre, ideolojik-politik hatları bir birine yakın olan güçlerin birliği gibi, safları daraltan politikaların yanlış olduğu görüşündeyiz. Bunun için, en geniş güç birlikleri için çaba göstereceğiz ve var olanlara güç katacağız.

Yurtsever, İlericiler, Sosyalistler !

En geniş güçlerin, içinde yer alacağı güç ve eylem birliklerini kurmalı, halklarımızın üzerine çöken faşizm belasına ve sömürgeci baskılara karşı mücadeleyi yükseltmeliyiz. Bunun için, tüm engelleri aşarak, ilerici yurtsever güçler arasındadayanışma ve dostluğu güçlendirmeliyiz. Bunu sağlamak ve en geniş güçbirliklerini yaratmak, hepimizin ortak, acil ve zorunlu bir görevidir.

- YAŞASIN TÜM İLERİCİ, YURTSEVERLERİN GÜÇ VE EYLEM BİRLİĞİ !
- YAŞASIN KÜRDİSTAN ULUSAL DEMOKRATİK MÜCADELESİ !
- KAHROLSUN SÖMÜRGECİ, ASKERİ-FAŞİST CUNTA !
- YAŞASIN TÜRKİYE VE KÜRDİSTAN HALKLARININ MÜCADELE BİRLİĞİ !

ALA RIZGARÎ RIZGARÎXWAZÊN NETEWÎ YÊN KURDISTANÊ (K U K)

PARTIYA SOSYALÎST YA KURDISTANA TIRKIYÊ (P S K T)

## STRANÊN ME

Dûmahîka r.6

Bi saya serketina Oktobra mezin kad roên kurde sazbendzan pêşda hatine. Nûra Cewarî Înstîtûta Akademîa Ermenîstanêye Îskeistvaêda kardike, bi stiranêd kurdîva mijûl dibe. Hetanî niha çend pirtûkê wê bi kurdî û ermenî çap bûne derheqa stiranêd kurdîda. Nûre niha doktora sazbendîêye. Sazbendzane ke kurde mayîn Cemîla Celîle, kîjan niha radîoa Rewanêye kurdîda kar dike di dereca stiranêd kurdîda. Tiştekî pir qîmete, ku çend pirtûkên wê li Moskow bi zimanê kurdî neşir bûne, ew jî bi kurdîya latînî. Lê Asîa Baxşî Sultanova, ku dota kurdaye û li Moskow dimîne, pir xebatên ulmî nvîsine ser mesela stiranên kurdî. Nûrê, Cemîle û Asîa vê demê endamên Yekîtîya kompozîtorên Sovîetîstanêne.

Belê, her tenê bi saya sîaseta Partîa Lenîne miletîê sazbendîya kurda gihîşte vê derecê, bi saya mîaserkirina bir û bawerîêd Oktobra mezin, xemxurîya Partîa Komûnîst û hukumeta Sovîet.

Temûr Xelîl Mûradov

## TV ya SWÊD

Dûmahîka r.8

dilê dujmin.


Hejar di êrişan da tim li pêşîya pêşmerge bû û di refê pêşîn da şer dikir. Di nav Partîyê da, di nav pêşmerge da, her usa jî di nav xelkê Kurd da pir jê hezdikirin. Bi mirina wî gelê Kurd lawekî xwe yî hêja windakir. Lê navê wî nayê bîrkirin û hevalên wî bi hezaran pêşmerge, îro jî şerê wî bo azadîya Kurdistanê bi mêranî bi rê va dibin.

## 600 LEŞKER TESLİM GIRTIN

Di van rojên dawî da rejîma xumeynî ya zordest zor da êrişên xwe û xula - mên wê yên Barzanî jî nav da. Lê hêzên welatparêz bi dil û can ber xwe didin, welat diparêzin, êrişên zordestan dişkînin. Pêşmergeyan çend roj berê, di navbera Mihabad û bokan da dor li leşkerê Îran girtin, ew şikandin û 600 kes ji wan hêsîr girtin, ew bêçek kirin.

## BIJİ YEKİTIYA HÊZÊN WELATPERWER

# İSVEÇ RADYOSUNUN
# KEMAL BURKAY İLE ROPORTAJI



İsveç Merkez Radyosu, geçtiğimiz Ocak ayı içerisinde Türkiye'deki son gelişmelerle ilgili olarak iki program sundu. Programlardan birinde Danimarka'lı bir gazetecinin Türkiye'deki gözlem ve yorumlarına yer verildi. Diğerinde ise, kısa süre önce Türkiye'yi ziyaret etmiş olan İsveç Sosyal Demokrat Partisi uluslararası ilişkiler bölümü sekreteri Piyer Şori ile Türkiye Kürdistanı Sosyalist Partisi Genel Sekreteri Kemal Burkay ve Politik nedenlerle uzun süredir İsveç'te bulunan Erhan Erdoğmuş görüşlerini belirttiler. Gerek Danimarka'lı gazeteci,gerek Piyer Şori, türk cuntasının demokrasiye dönmeye niyetli olmadığını,aksine, gerici bir diktatörlüğü kalıcı kılmaya çalıştığını, gelişmelerin anti-demokratik yönde olduğunu açık bir biçimde belirttiler; cuntayı sert şekilde eleştirdiler.

14 Ocak'ta yayınlanan ikinci programla ilgili olarak Türkiye'nin Stockholm Büyük Elçisi, İsveç radyosunu protesto ederek Türkiye'nin içişlerine karışıldığını ileri sürdü.

Kemal Burkay'la yapılan röportajın radyoda yayınlanan bölümünü türkçeye çevirdik ve aşağıda okurlarımıza sunuyoruz. Soruları İsveç radyosu adına kürt gazetecisi Mahmut Baksi sordu.

*"Kemal Burkay Kürdistan Sosyalist Partisinin lideridir. Aynı zamanda tanınmış bir kürt avukatı ve yazarıdır. Türkiye'de siyasi eylemlerinden dolayı birçok kez hapis yatmıştır. Cuntanın yönetime el koymasından sonra vatandaşlıktan çıkarıldı. Şu anda ziyaret nedeniyle İsveç'te bulunmaktadır.*

SORU: Sizce Cuntanın 12 Eylül'de yönetime el koymasının nedenleri nedir?

*KEMAL BURKAY: Cunta, darbeye temel gerekçe olarak terör olaylarını gösterdi ve ordunun, teröre son verdikten sonra kışlasına döneceğini söyledi. NATO çevreleri de Cunta'nın bu beyanının geniş propagandasını yaptılar. Ne yazık ki bazı demokratik çevreler ve kişiler de bu propagandaya inandılar, Cunta'nın terörü önleyip demokrasiye dönme amacında olduğunu sandılar. Ancak bunun gerçeklerle bir ilgisi yoktu. Türkiye'de ordunun "kurtaracağı" bir demokrasi zaten hiçbir dönemde var olmamıştır. Türkiye'de Cumhuriyetin kurulduğu 1923 yılından beri kitleler sürekli olarak demokratik haklar için mücadele ediyorlar. Ancak demokrasi istemlerine her keresinde orduyla, polisle, hapisle cevap verildi. Binlerce demokrat, aydın kişi, solcu türlü biçimde baskı gördüler,hapsedildiler, katledildiler. Ulusal haklar isteyen Kürt halkından onbinlercesini kırımdan geçirdiler.*

*Yarı- askeri birlikler-bozkurtlar-örgütleyen faşist MHP bizzat devletten himaye gördü ve ordu içinde de örgütlendi. Bunlar, demokrasi mücadelesine karşı saldırgan bir güç olarak kullanıldılar. Ama ne zaman ki bu ve benzer örgütlerle solun, işçi sınıfı hareketinin ve Kürt halkının ulusal demokratik mücadelesinin önünün alınamayacağı anlaşıldı, o zaman doğrudan ordu harekete geçirildi. Cunta, terörü önlemek için değil, Türk emekçi kitlelerinin ve Kürt halkının mücadelesini ezmek için idareye el koydu. Cunta,iktidara el koymak için terörden özellikle yararlandı. Şimdi ise halk kitleleri üzerinde bir devlet terörü estirmektedir.*

*Cuntanın ekonomi politikasına ilişkin olarak :*

*"Cunta'nın, Turgut Özal tarafından yönlendirilen Freedmann'cı, ekonomi politikası halk kitlelerini sert biçimde eziyor. Yüksek enflasyon oranı bir derecede düşürüldü ise de bu kitlelerin büyük ölçüde yoksullaşması pahasına oldu. Emekçilerin satın alma gücü yarı yarıya düştü. Orta ve küçük üreticiler yıkıma gidiyor. Bu politika yalnızca bir avuç vurguncuya yarıyor. Bu nedenle halk kitlelerinin cuntaya karşı tepkileri giderek büyüyor."*

*Türkiye'de demokrasiye dönüşe ilişkin olarak:*

*"Cunta şefi Evren, sözde bir demokrasiye dönüş takvimi verdi ve şu anda Ankara'da "Danışma Meclisi" toplanmış bulunuyor. Ancak bunlar bir aldatmacadan başka bir şey değil. Cuntanın amacı demokrasiye varmak değildir.Cunta, daha sonra faaliyet gösterebilecek siyasi partileri kendi görüşüne uygun şekilde biçimlendirmeye çalışıyor. Basın özgürlüğünü, demokratik hak ve özgürlükleri, eski anayasa 'da olduğundan çok daha geriye götürüp tam kuşa çevirmek istiyorlar. Kanımca Türkiye'nin bu günkü rejimi tipik bir faşizmdir. Cunta bunu daha da kurumlaştırıp kalıcı kılmaya çalışıyor. Cuntanın demokrasiye döneceğini sananlar sadece düş görüyorlar. Bir örnek daha: Cunta, serbest sendika diye kendi denetiminde bir tek sendika istiyor,siyasi partilerde olduğu gibi. Türkiye'nin bir kısım uluslararası örgütlerdeki durumuna gelince, gerek Türkiye'nin anti-demokratik yasaları, gerek türk hükümetlerinin bu türden uygulamaları, daha önce de onun bu tür örgütlere girmesine uygun düşmüyordu.Türkiye Birleşmiş Milletlerin,Avrupa Konseyi ve Parlamentosu'nun prensiplerine hiçbir zaman uymamıştır.*

*"Batılı ülkelerin Türkiye'ye yaptıkları yardım ne türk ne de kürt halkının yararına değildir. Bu olanaklar halka karşı kullanılıyor. Cunta ekonomik yardım aldığı sürece konumunu güçlendirebilir, ömrünü uzatabilir.O hiç bir zaman demokrasi getirmeyecektir ; çünkü onun görevi demokrasiyi önlemektir."*

---

## TV,ya SWÊD ŞERÊ KURDİSTANÊ NİŞAN DA

Di meha çûyî da (Çileyê Paşîn) telewîzyona Swêdê li ser şerê partîzanî di Kurdistana Iraqê da programek nîşan da. Di programê da mesûlê Yekîtî Niştimanî Kurdistan Omer Şêxmûs û jina wî ya Swêdî ku di Kurdistanê da nav şer da gelek waxt mabû, derheqa tevgera neteweyî da malûmat dan.

Telewîzyonê filmên ku di Kurdistana Iraqê da hatibû kişandan nîşan da. Di filmê da bombebarana teyareyên Iraqê li mintiqayê pêşmerge û li ser gundan xweş hatibû tesbîtkirin.

Di programê da mesûlê telewîzyonê ji jina Omer, Agnetayê pirsî:

"Tu jî tev li şer bûyî?"

"Belê bûm."

"Tu dikarî merivan bikujî?"

Agneta'yê, bê guman, bersiva wî da: "Bo rizgarîya miletê Kurd, dikarim bikujim."

Di dawîya programê da, mesûlê telewîzyonê bi rojnamevanê Kurd Mahmût Baksi ra jî xeberda. Jê pirsî, got:

"Kurdistan di bin destê gele dewletan da ye, rizgarkirina wê hêsan dibe?" Baksi usa got:

"Îro 150 hezar kîlometir muraba erdê Kurdistanê ji bin destê dujmin xilasbûye û di bin destê hêzên welatparêz da ye, pêşmerge wê diparêze. Eger hûn welatên xerbî alîkarîya wan dewletan nekin emê Kurdistanê zû rizgar dikin..."

Mahmût Baksi, di 7'ê Sibatê da jî, di telewîzyona Swêd da, di beşa yûnanî da çisekir û bersîva pirsên mesûlê programê da. Baksi got:

"Em dikarin û dixwazin bi gelên Tirk, Ereb û Faris ra bi hevaltî û dostanî bijîn. Lê Kurdistan bila rizgar be, her gel li ser welatê xwe azad be; meriv dikare bi vî şiklî wek dostên rastî bi hevra bijî".

### HEZARAN ŞEHİD BÛN

Serokhêzê hêla Mihabadê, "Hêza Pêşewa", û endamê Komîta Merkezî a PDK-Îran, Hejar di van şerên dawîn da şehîd bû.

Hejar, berî şoreşê di ordîya Îranê da zabit bû. Piştî şoreşê tevî hêzê pêşmerge bû. Zabitek jêhatî bû,her ûsa jî di nav refên pêşmerge da şerê partîzanî bi hostatî dikir.Seroka Hêza Pêşewa bû ku ew hêz di mintiqa Mihabadê bi mêranî şer dike û tirs daye

Dûmahik r.7

ROJA NU
ORGANA KOMELA KARKERÊN KURDISTAN LI SWÊD
XWEDİ : KOMELA KARKERÊN KURDİSTAN LI SWÊD
ADRES: BOX 4038 141 04 HUDDINGE- SWEDEN
JI MEHÊ CAREK DERTÊ BUHA 5 KRON HESAP NO : PG 45 89 80 - 0